

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
* **Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* **Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

*Hejmar (115)* *Sal 20* *Cotmeh 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


# Rola Kurdan di Kirîza Sûriyê de


▪ **Mihyedîn Şêx Allî**


Ev nêzî pênc salan e rewşa Sûriyê di sîngê weşanan de cî digire û di asta navdewletî de jî bi dehan kongir ji bo wê hatine lidarxistin. Çalakiyên ragihandinê yên curbecur hatine bikaranîn û di raya giştî de rola xwe lîstine.

Lê, baş xuya bûye, ku li ba piraniya hemwelatiyên civaka Sûrî û di çavên wan de, ewqas nemane ciyê rêzgirtinê, ji ber ku, hema bi kurtî, ewqas TV, Encûmen, sozên serok û wezîran, rê li ber şerê qirêj teng nekiriye, carina jî bi peyvên qelew û durişmên gerim, ew agira hatiye gurkirin û hêjî berdewam dike. Bê guman jiyan û berjewendiyên civakê û yên me hemiyan, berî her tiştî di rawestandina xwînherikandinê de ye.

Di despêka kirîza Sûriyê de, Turkiya AKP-ê, çi aşkere, çi bi dizî, di germkirin û gurkirina hinde hêz û partiyên opozosyona Sûriyê de, xwedî roleke sereke bû. Li bajarê Antaliya kongira Encûmena Niştîmanî ya Sûrî bi serkêşiya (Îslama siyasî) hate hembêzkirin. Dûv re, ……….❷



## Salvegera pêncem ya goçkirina hevalê me Ismaîl Umer

Li 18ê meha Cotmehê, pênc sal di ser goçkirina serokê partiya me hevalê nemir Îsmaîl Umer re derbas bûn. Li wê boneyê, rêxistinên partiya me PYDKSê li gelek deverên karê xwe, bone bi bîr anî û ahengên taybet li dar xistin. ………❺

## Kiryarên Hovane

Li bajarê Şirnexê li Bakurê Kurdistanê, careke din hêzên ewlehî yên dewlta Tirkiyê ser rûyê xwe yê faşî veda û careke din mêlag kirin, ku piştî sed salî be jî ((gur eyarê xwe navê)). Ew ramana nijadperset ku nod û pên sal in dewleta Tirk li ser rabûye û siyaseta xwe ya şoven di tenga gelê Kurd re dimeşîne, ……….❺

## PARTİYÊ N KURDISTANI: BILA DEWLATA ME XERA NEBE

Li navenda Partiya Azadî ya Kurdistanê (PAKê) ya li Amedê, partiyên kurdistanî yên wekî AZADÎ, KADEP, OSP, PAK, PAKURD û PDK-BAKUR daxuyaniyeke çapemeniyê weşandin. ....❺

# Mejiyê Ne Dîmokrat... Derd e

**Merwan Berekat**

Li Rojhilata Navîn û ta astekê li seranserî cîhanê jî, ji aliyê destlatdar, sazî, partî û hemî navend û desteyên ku bi wan ve girêdayî ne, û herweha ji aliyê piranya siyasetmedar û rewşenbîran ve, têrmek ( bêjeyek ) pir tê bilêvkirin, û di bin siya wê de hemû karên vajayî naveroka wê tên kirin. Belê **demoqratî**…. Ew ji aliyê piraniya rêxistin û dezgehan ve durişme tê bilindkirin, û nîşan didin ku ew di karê xwe de wê cêbecî dikin. Lê piraniya wan derew û badanê di dermafê demoqratiyê de dikin, û li gora daxwezên xwe wê diguhêrin.

Li pir welatan; ji aliyê destlatdaran ve, û di bin navê demoqratiyê de zordarî, nedadmendî, berjewenditên kesayetî…. tên kirin.

Di bin sîwana demokrasiya derewîn de pir tiştên seyr û ne rewa têne kirin. Li welatên ku destlatdar demokrasiyê li gora bejna xwe dipîvin tiştek navê wê nêrîna azad, rewşenbîriya rexekirinê û berçavkirina şaşîtiyên rêvebiran xêzên sor in, …...⓫

---

**Rola Kurdan … Dûmahîk**

ev Encûmen hate berfirehkirin, kiwalisyona hêzên şoreş û opozosyonê (Îtîlaf) nav lê bû, û Istenbol jê re bû cîwar û navend, ji bilî bajarên dî, mîna Gazî Entap, Antakiya, Reyhanlî, Şanli Urfa, … hwd.

Di siha vê kiwalisyonê de û bi rêdana hin karbedestên Turkiyê, bi hezaran kadro û kesên (mucahîd) û dilxwazên rêbaza rêxistina El-Qa´îde (Ûsame Binladin, Ebo Miseb Zerqawî, Mille Umer, Eymen Zewahirî) derbazî hundirê Sûriyê bûn, û ji hêla beşek ji civaka Sûrî de hatin pêşwazkirin, û di bin durişmên serhildana gelê Sûrî de sûd û alîkarî dîtin û cî girtin. Vêca, têkoşîn û serîhildana gelê Sûrî ya aştiyane, ya ku rûmet û azadî ji xwe re kiribû armanc, ji riya xwe derket û beravêtî bû. Ji xwe, desthilatdariya rijîmê jî, çav li rê bû, û bi gelek şêwe û pîlanan hewil dida, ku ew serhildana dadmend bişimite, dest bi karê çekdariyê bike û berê xwe bide derve û hêviyan li ser sozan ava bike .

Di çerçewa vê tabloyê de, piraniya cemawerê Kurd li Bakurê Sûriyê karîbû pêşiya xwe bibîne û nebe destik. Lewre jî, ew îro xwedî roleke erênî û balkêş e, nemaze ligel pêkhateyên Ereb, Suryan-Kildo-Aşor… û HWD, li seranserî herêmên Cizîrê, Kobanê, Girê Sipî (Til Ebyed), Şêx Meqsûda Helebê û Efrîna Kurdaxê, li beramber piroje û metirsiyên terora rêxistina Da´îş û Cebhit El-nusra bi serkeftî têdikoşe û li ber xwe dide, loma jî, di qada navdweletî û li ba rêxistinên civaka sivîl li seranserî cîhanê, bûye ciyê rêzgirtinekê, û bi rastî dihêle mirov bêje: Kurd di kirîza Sûriyê de rûsipî û xwedî roleke erênî ne.

Hinde dezgehên ragihandinê, di bin bandor û kartêkirina helwestên serokatiya kiwalisyonê de, dixwazin rastiyên bûyeran berûvajî bikin, dibêjin hêza Kurdan li bakurê Sûriyê YPG – YPJ, Turkmen û Ereban qir dikin !, Kurd cudaxwazin û hewl didin Sûriyê parçe bikin !!

Hêjayî gotinê ye, ku xwediyên van reklam û piropagandên neberpirsyar, li razîkirina AKP-ê û Îxwan Mislimînan digerin, bi ser de jî, şovenîzman li dijî gelê Kurd gur dikin.

Çendî newekhevî û hinde nakokî jî di çerçewa tevgera azadîxwaz a Kurd de hebin, lê bi tevahî, rasterast xwe li dijî hovîtiya teror û toximperestiyê dibîne, aştîxwaz û mirovhez in, lewre jî, canfîdayên gelê Kurd (çi Gerîla, Pêşmerge, YPG û YPJ…) di çavên xelkê de ciyê rêzgirtinê ne û di dilan de cî digrin.

Bawerî li cî ye, ku Kurdan bi gelemperî riya xwe nas kirine, û êdî baş dizanin, ku bela serê wan û metirsiya li dijî hebûn û berxwedana wan, ne Emrîka û Rûsiya ne, ne jî Çîn û Japon in … Neyar û bela serê Kurdan çand û siyaseta nijadperest, hovîtiya terorê û derdê nezaniyê bi xwe ye.

# Civîna Girseya Partiyên Lêveger Siyasî ya Kurdî li Sûryê

Wekî hatiye zanîn, piştî ku Encûmena Niştimanî ya Kurdî dev ji Lêvegera Siyasî ya kurdî berda, partiyên Vegergehê yên ku li derveyî ENKSê man û ne bi ser TEV-DEMê de bûn jî, li ser hev man û civînên xwe di bin navê Girseya Partiyên Vegergeha Siyasî(GPVS) berdewam kirin. Ew partî jî ev in: P.Yekîtî Demokrat a Kurd, P. Çepa Demokrat, P. Rêkeftin, P. Demokratî Kurdî Sûrî- Alpartî, P. Yekîtî Kurdistanî. Di navbera çend mehan de ji şêwir û civînan, wan partiyan desteyeke rêvebir ji GPVSê re û teşeyekî rêxistinî jî ji xwe re danîn û ava kirin. Li dîroka 24/10/2015an, desteya rêvebir a GPVSê civîna xwe ya asayî li Qamîşlo girêda û ragihandinek li derbarê karûbarên xwe belav kir. Di ragihandina wê de du mijarên sereke hati bûn gengeşekirin, bi kurtî ev tê de hati bûn:

**-Di warê rêxistinî de:**

Desteya rêvebir ya GPVSê li ser rewşên rêxistinî rawestî û bi ferehî li ser axivî. Raporên ku ji komîteyên deverkî û desteya îdarî de hati bûn, hatin xwendin û di riya wan re, karûbar hatin nirxandin û ev biryar hatin standina:

Komîtên şaxan li Kobanê, Efrînê, Herêma Kurdistanê, Tirkiyê, Libnanê û Ewrupa wê werin avakirin.

Komîtek ji bo amadekirina bernameke siyasî were avakirin. Ew bernama wê bi navê GPVS li ser partiyên siyasî, saziyên civakî û kesayetiyên serbixwe were belavkirin. Ew bername wê bibe belgenameyeke bingehîn ji çarçeweke siyasî ye tevahî û fere re.

Hevdîtinek bi serokatiya Rêvebiriya Xweser re wer amadekirin, tê de rewşa rêbazên (minhac) rêzên (yek, didu, sisê) yên perwerdeya bingehîn û tevahiya rewşa fêrkirin û perwerdeyê were gengeşekirin.

Berdewamkirina hevdîtinan bi partiyên bira û yên niştimanî Sûrî re.

**-Di warê siyasî de:**

Civatê teqez kir, ku riya çêtir ji bo çareserkirina qeyrana Sûryê, ew e ku lihevkirineke navdewletî û herêmkî li ser ``nexşeyeke rêkê`` di bin sîwana Netewyên Yekbûyî de were danîn... Ji sûryan û hêzên netewî û dîmokratîk jî tê xwastin, ku riya çareseriya siyasî û zimanê hevpeyvînê û pejirandina hev bidin ber xwe, daku pirojeyeke siyasî ye lihevkirî peyda bikin. Tundûtûjî û xwînrêtin raweste, têror têk here û dewleta maf û zagonê jî were damezrandin.

# Gotina Navça Dêrik di pêncemîn konfiransa wê de

**Mêvanên birêz**

**Sekretêr û nûnerên partî û rêxistinên beşdar**

**Sazî û rêxistinên sivîl**

**Dost û hevalên hêja**

**Beşdarên bi rûmet**

Hêjayî gotinê ye, ku li darxistina kongira me bi pêncemîn salvegera koçbarkirina serokê partiya me têkoşer û xebatkar Isma'îl Umer re li hev hatiye, bi vê boneyê em dibêjin wefadriya me jê re, xebata rojane ye ji bo berdawmkirina ala xebata di ber aştî, azadî û wekheviyê de ye.

**Dostino.. Hevalino:**



Ev pêncemîn kongira navça (DÊRIKê) ye, ku li gora xalên tozika partiya me ya hundirî..⓫

## Gotina Navça … Dûmahîk

tê lidarxistin, ew tozika ku kongira heftemîn a partiya me ku di avdara 2013`an de, li Çiyayê Kurm;nc (Efrîn) hati bû lidarxistin û li ser erê kiri bû. Li hêla din, ev konfirans di demeke hestyar û nazik de tê lidarxistin, ku welatê me SÛRIYÊ di rewşeke kambax û dijwar re derbas dibe, piştî ku rijêmê hemî çekên giran û bermîlên teqîner di dermafê xwepêşandanên sivîl û serhildana aştiyane de, ya ku gelê sûriyê ji bo bidestxistina mafê jiyanek rûmetdar û azad pê rabû bû, ew şoreşa ku rijêmê hêdî hêdî bi aliyê çekdariyê de ajot, xiste warê şer û cengeke qirêj û gemar û welat bi tevahî ji hemû kes û hêzên hişkbawer û tundrew re bû aramanc. Wan, bi mebesta bizava olî, ji hemî welatan berê xwe dane Sûriyê, û bi alîkariya hin dewletên cîran derbasî welatê me bûn û dest bi serjêkirin û talankirina mal û mewdan û jinan jî kirin.

Weke tê zanîn, partiya me ji yên pêşîn bû, ku metirsiya xwe ji vê yekê diyar û berçav kir, û li ser xebata aştiyane û xwepêşandanên sivîl ta niha jî teqez dike, me li her cihî û ji her kesî re jî digot, ku riya çareseriyê tenê di hevpejrandin, hişmendî û gotûbêjê de ye, lê belê vîn û berjewendiyên kesan, têvedan û destêwerdanên herêmî û navdewletî bi hêztir bûn, encama wan jî, bûye bêtirî çar salan girtin, kuştin, wêrankirin û herfandina civakê tê kirin, û bingeha welêt tê herifandin, ta îro jî, tu sûde jê nehatiye wergirtin, tenê berjewendiyên çekfiroş û şerxwazan hatin bicîkirin û parastin.

Îro piştî vê kuştin û wêrankirinê , îdî ji herkesî re zelal û diyar bû, ku şer û tundetûjî ne riya çareseriyê ne, şer tenê wêrankirin, talankirin, mişextî û koçberiyê bi xwe re tînin, êdî her kes dizane çareseriya leşkerî ji vê kirîzê re bê mifa ye, bi taybetî jî piştî ev şapa koçberiyê ya metirsîdar û bi saw e, çimkî berdewamiya koçberiyê bi vî rengî dê welat ji xelk û xwediyê xwe vala bibe, û guhertina dîmugrafîk di herêmên me de çêbibe, loma erk û stûbariya me tevan e, partî, hemû pêkhateyên civakê û kesên xemxwerên parastina berjewendiya gel û pirsa kurdî di ber de berpirsyar in, ku mil li mil û bi hev re xebatê bikin, da ku em kari bin hinekî rê li ber şapa koçberiyê bigirin, gava yekemîn jî ji vejandina yekrêzî û serastkirina mala kurdî de dest pê dike, ev yeka han dê li gor berjewendiyên hemî pêkhateyên ku di herêmên me yên kurdî de dijîn be, wê mafên wan hemiyan biparêze, çimkî yekrêziya kurdî dê aştiya navxweyî di civakê de biparêze.

Tê xwestin ku em nameyeke xurt û watedar bigihînin kesên xwe yên ku bêhêvî bûne, ji wan re bêjin, bêhêvîtî mirin e, jiyan bê hêvî berdewam nabe, tenê koçberî û windabûn e, pêdariya ser xaka welêt jî rûmeteke nirxdar û giranbuha ye, ku ta vê gavê hin kesên me, xelkine me, xwedî vîn û hestekî xurt in, amade ne ku jiyana xwe cangorî gel û xaka welatê xwe bikin, qîz û lawên me li hember van hêzên tundirew û hişkbawer, qehreman û leheng in, berevaniya wan a mezin ji pêdariya me li ser xaka welêt tê, hîn kesin me hene zanin pakrewanî çî ye, pê bawer in û jê re amade ne, ji me jî tê xwestin ku em van baweriyan di civakê de biçînin, ji nirxên pakrewaniyê re wefadar bin, wefadariya pêşî jî ew e, ku keç û xortên me yên berevaniyê dikin, zani bin û bawer bin ku hîna tiştên buha hene, hêja ye ku berevaniyê di ber de bikin, hîna kesin hene, nirxên pakrewaniyê di mejî û wijdanê wan de cî giritine, dê nehêlin ev nirx erzan bibin, li hêla din jî hîna kesin hene, bawer û amede ne, digel ku çiqas asteng, kelem û zehmetî peyda bibin jî, karê rêzanî û rêxistinî yê aştiyane berdewam bikin, û bi şêweyekî erênî danûsitandinê bi rêveberiya xweser re dikin, armanc jî pêşxistin û serastkirina karê wê, kêmkirina qelsî û şaşiyan û cîbicîkirina başiyan e, çimkî ev rêveberî ji bo birêvebirina kar û barên rojane yên gel û civakê giring e, herweha giringiya hebûna yasa û zagonê di rewşeke weha de ji serberdayetiyê baştir e, ev şêweyê danûstandina erênî, yek ji biryarên kongira heftemîn û civata fireh a partiya me ye, ku piştî kongir hati bû lidarxistin .

Em ji vî cihî, ji vê kongirê ji heval û gelê xwe re dibêjin. Emê alavên geşkirin û gurkirina xebat û jiyana rêxistinî bi dest xwe bixin, bo em hîmên bigihîn di paşeroja welatê me sûriyê de damezrînin, Sûriyeke bê zordarî û tundetûjî, Sûriyeke rengereng ku ciyê her kes, ol, çand, ziman û hemî layanên rêzanî tê de hebin, û karibe van hemî aliyan hembêz bike.

## Salvegera pêncem … Dûmahîk



Li derveyî welêt jî aheng li dar ketin. Ahenga herî mezin li Komara Almaniya Federal li dar ket. Bi sedan dost û hevalên partiyê û hezkiriyên Hevalê nemir Isma`îl Umer û siyasetmedar û rewşenbîr lê amade bûn. Di nava beşdaran de, hunermendê Kurd ê bi navûdeng Şivan Perwer û hunermendê Efrînê yê dengxweş Hikmet cemîl jî lê amade bûn. Di ahengê de li ser sinciyên bilind û bîrûbaweriyên zelal ên hevalê me Ismaîl Umer hate axaftin. Wan her du hunermendan jî gotinên giranbuha li ser doza gelê Kurd û yekîtiya xebat û xebatkarên wî kirin. Em jî bi navê nivîskarên Rojnama Newroz wê boneya reşgiran bi bîr tînin û serê dost, heval û gelê me xweş dikin.

## Kiryarên hovane … Dûmahîk



hîn a berê ye, û helwest û kiryarên sazî û îdareyên wê jî bostekê nehatine guhertin, na belê hîn ((firkek lê zêde bûye)). Bi rastî, mirov mitêl(ecêb) dibe û dibihite, dema dibîne, ku dewletek mîna Tirkiyê, endama Nato û namzeta Yekîtiya Ewrupa û xwe dîmokrat û parêzvana mafên mirovan jî dibîne, li pêş çavên cîhana şaristanî dadikeve asta herî nizim û çepel û kiryarên qirêj û pir hovane dike.

Li roja sisiyan ji miha Cotmehê, xortekî Kurd î bîst û çar salî bi navê Hecî Luqman bi birîndarî ji hêla hêzên ewlehiya Tirkiyê de hate girtin; Lê li şûna ku hêzên dewletê rêzdariyê ji zagonên navdewletî û mafên mirovan re bigirin, birîndêr derman bikin û wek girtiyekî xwedî mafên rewa û taybet bibînin, wan ew bi paş makîneke leşkerî ve girêda û di kolanên bajarê Şirnexê re xuşand ta jiyana xwe ji dest da. Lê belê, û zor mixabin! ji bilî çend alavên ragihandinê û hinek malperên pêwendiya civakî ew nûçe û wêne ne weşandin. Ev helwesta ne dadmend û bi guman ya piraniya mîdiya cîhanî, ji aliyekî de nebêlaniya wan destnîşan dike, û ji aliyekî din de jî, lawazî û qelsiya mîdiya kurdî tîne ber çavan.

## Partiyên … Dûmahîk



Daxuyaniya hevbeş a li ser rewşa siyasî ya Heremê Kurdistanê ji aliyê Serokê PAKURDê Îbrahîm Xelîl Baran ve hate xwendin

Daxuyaniyê di serî de bal kişande ser destkeftina Kurdan a sedsala dawîn û got: 'Rol û bandora Dewleta Federe Ya Herêma Kurdistanê ji gelek dewlet û hêzên herêmê zêdetir e. Ev destkeftin û ev dem, di dîroka neteweya me de dem û pêvejoyeke siyasî ya zêrîn e'.

Daxuyaniyê ev destkeftin sparte hemû partî û rêxistinên Herêma Kurdistanê; herwiha berhema ked, xebat û pişrgirîya hemû gelên çar perçeyên Kurdistanê.

Daxuyaniyê şerê terorî yê DAIŞê, ambargoya aborî ya hikûmeta navendî ya Bexdayê û enrîkayên li ser Herêmê şermezar kirin.

Partiyan ji bo çareserkirina krîza serokatiyê jî bang li aliyên têkildar kir ku pergala serokatî û parlementeriyê biparêzin; herwiha bila siyasetmedarên Herêmê jî li hemberî lîstik, entrîka û şerê meşandî hişyar bin

Ber bi dawiya daxuyaniyê hinek şîret û pêşniyarên wiha li siyasetmedarên herêmê hatine kirin: Divê komîteyeke taybet a bêalî bûyerên dawîn bişopîne û kiryarên derqanûnî darizîne. Herwiha divê partiyên siyasî bi riyên guftûgo, diyalog û rêzgirtinê pirsgirêkên xwe çareser bikin; kurdistaniyên cîhanê jî piştgiriya Herêma Kurdistanê bikin.

Di dawiyê de jî wiha hate gotin: 'Divê gelê me di armanca dewletbûnê de bi serbikeve!

# Xwendina bi Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê.. Bîranîn




▪ Abdulqadir Hourî

Ez li bajarê Helebê mezin bûm. Ango min hemû zarotî, ciwanî û mêraniya xwe li dervayî welatê bav û kalan buhurand. Tiştekî normal û asayî bû ku ez hêdî hêdî ta destpêka salên heftêyî ji sedsala borî ji zimanê dayika xwe dûr kevim û ji bîr bikim jî, ji ber ku zimanekî dîtir li ser min ferz bûbû, û ez ber xwe ve dikişandim. Ji bo ku ez vegerim zimanê zikmakî di jiyana xwe de û bi kar bînim, ez dikarim bêjim ku du tiştên dijberî hev alîkariya min kirin . Yek, Tevgera siyasî a Kurd li welêt, û dengvedana şoreşa li Kurdistana Başûr bi serokatiya nemir Mele Mustefa Baraznî bûn. Wan rê dan hestên min ên netewî, û ez fêrî ramana ku dibêje: Mirovê bê kok, ziman, dîrok û kultûr mîna peykerekî sexte li ser sergûyan hatiye avêtin e!. Didu, di navînên sedala borî de, dezgehên bi kurdî yên ragihandinê yên dikarîbûn sînoran bibirin kêm bûn, ên hebûn jî, dezgehên dewlet û desthilatan bûn. Her Mirovekî nikarîbû bi hêsanî kitêbeke kurdî li ser Kurdan daxive, peyda bikira. Tiştê bo min hêsan, fêrbûn û fehmkirina zimanê kurdî bi riya radiyoyan bû, çûnkû guhdarikirina radiyoyan bê asteng bû. Ji mirov dihate xwestin bes amîreke radiyo peyda bike û guhdarî pirogramên bi kurdî bike. Li wan deman, pexşa bi hêz ji du radiyoyan digihştin bajarê Helebê. Radiyoyê yekem ((Radiyoyê Yerêvanê)) bû, ya diwem jî ((Radiyoya Komara Îraqê)) yê ku bi navê rêjîma Ba`is dirûşmdar bû.

Li salên heftêyî ya sedsala bîstan, ez xortekî genc bûm. Evîndarê pirtûk û kovaran bûm. Min nûçeyên ku serkeftinên Kurdan an jî binketinên wan bi zimanê erebî dixwendin û ji radiyoyan dibihîstin. Roj bi roj û bi taybetî di werzên Havîn û Payîzan de,dema ku heyam û ba ji gihandina pexşên li ser pêlên kurt ên ji radiyoyan bi hêsanî dibarîn, digihştin guhdaran, hêrs didan û kêfa xwe bi bihîstina pexşên kurdî tanî. Yek ji radiyoyên ku riya zimanê kurdî li ba min vekir Radiyoyê Îraqa Ba`is bû!!. Ez her roj li benda programa kurdî ya wê radiyoyê bûm. Min nûçeyên bi Kurmancî û Soranî dibihistin, lê min her tişt jê fêm ne dikir, ji ber ku peyvên nuh yên hîç carekê li ber guhên min neketibûn hebûn. Lê bihîstina xwendina bi zimanê kurdî weke awazeke xweş di ber guhên min re diçû û dihat. Stranên Meryem Xan û Kawîs Axa ez dibirim dinyeke din . Pir caran stranên kurdî, ez têvedidam ku hêsir ji çavên min bibarin. Ez dikarim bêjim, ku radiyoyan ziman li ba min ji mirin û wendabûnê xelas kir. Dema min guhdarî radiyoya Îraqa Ba`is dikir, min tiştên ku Ba`isiyan li dijî kurdan belav dikirin diavête paş xwe. Armanca min fêmkirina zimanê kurdî bû, heta radekê ku ez dikarim kurdî fehm bikim, lê hêdî hêdî guftugo û dengkirina min bi kurdiya şêrîn, roj bi roj ber ciwaniyê diçû. Ezê ji xwendevan re du bûyerên pêkenok li ser xwe û kurdiya xwe ya qels a wê demê bêjim.

Sala 1976an, min ligel hevalekî xwe ji koçerên Cizîrê serdana herêma Dêrîkê kir. Wek tê zanîn, zaravê koçeran ji nexwendeyan re zor dijwar e. Xwedî û merivên hevalê min, bi min re ketin danûstandinê daku bi mêvanê malê re hevnasînê bikin. Min bi zorê ji wan çend peyv fehm dikirin, û ewan jî bi dijwarî çend peyv û hevok ji min fehm dikirin, heta gihîştê, merivekî bi hêrs ji hevalê min re got: Law Ehmed! Te ev merivê Ereb ji kûderê aniye kuro?!.

Li sala 1977an, ez û hevalekî xwe çûn mala bavê kecikeke Kurd, weke (xwazgencî), …..⓫

## Gelê Kurd ... Kok û ziman .....(1)

▪ **Rozad Elî**

Rojhilata Navîn a Kevin ji hêla xaknîgarî de parve sê herêmên sereke dibe: Asya Biçûk û Çiyayê Torosê li Bakur, navçeyên çiyayên Zagrosê li Rojhilat û Nîvgirava Erebî û Welatê Şamê li Başûr. Ev sê herêmên xaknîgar ji aliyên heyamî, kendûkorî û gelên ku tê de dijîn ve ji hev cuda ne. Ew her sê herêm bi riya kembereke xaknîgarî a kevanî digihên hev, ji wê herêma girêkok re Kevana Şov tê gotin. Herêma Kevanî a şov jî li aliyê rojava ji Filestîn û Urdunê de dest pêdike û peravên rojhilatî yên derya Sipî di nav xwe de digire. Ji hêla bakur de jî digihê avrazên çiyayên Torosê. Beşê wê yê rojhilatî jî bi hêla başûr rojhilat de bi çemên Ferêt û Dîcle re dimeşe ta digihê Kendava Erebî, ew beşa ji Kevana Şov bi navê Welatê Mîzopotamiya jî bi nav dibe.

Beşê Bakur ji herêma Mîzopotamiya çiyayî ye û ji destpêka dîrokê de ji hêla gelên ku wek bapîrên kurdan tên jmartin de şên bû. Beşê wê ê Başûr jî deştî ye, ew jî li demên destpêka dîrokê welatê gelê Somerî ê navdar bû.

Ji hêla kendûkorî ve jî, Rojhilata Nêzîk parve du herêmên cudawaz dibe: Navçeyên çiyayî li Bakur û Rojhilat, ew ji bêlên çiyayên Toros û Zagrosê pêk tên. Li Başûr û Başûr Rojava jî deşt û biyaban in, ew jî ji Nîvgirava Erebî û Welatê Şamê pêk tê.


Lêkolînên şûnewarî dupat dikin, ku navça Rojhilata Nêzîk ji berî 100 hezar sal de ji nijadmirovê Niyandirtalî re cihê jiyan û rûniştinê bû. Şopên wî pêşemirovî li gelek deverên Rojhilata Nêzîk hatine dîtin, mîna Filestînê û Libnanê. Derande û şûnewarên wî li gelek deverên Kurdistanê jî hatine dîtin, mîna li Efrînê li şikefta Duderiyê li çiyayê Lêlûn û Şêrewa, li cîgeha Zerzê Şanîder li navça Silêmaniyê, li Wanê, Qarsê, Hekarî û li gelek deverên din jî.

Lêkolînên şûnewarî destnîşan jî dikin, ku piştî windabûna pêmşirovê Niyandirtalî ji serzemînê, mirovê hişdar ê seretayî jî li van navçan peyda bûye. Dîroka derandeyan, mirovê hişdar vedigerîne dora pêncî hezar salî. Warên wî ên herî giring li Rojhilata Navîn li Başûrê Kurdistanê li şikefta Şanîderê hatine dîtin. Temenê qerqodeyê ku li wî cîgehî hatiye dîtin, vedigere dora çel hezar salî. Ji bilî wê derandeyê, gundikekî çandiniyê yî biçûk jî ku ji deh hezar sal berî zayînê de li wir hati bû avakirin hatiye naskirin. Li Rojavaya Kurdistanê jî gundikekî çandiniyê yî kevin li kêleka girê Endarê li ber çemê Efrînê ser hatiye vedan, li gor texmînên zanistî, dîroka şêngeha Endarê jî vedigere dor deh hezar salî.

Ji van zanîn û lêkolînan diyar dibe, ku Kurdistan ji demên pir kevin de herdem şên bû, û cihê rûniştina mirov bû, çi yê Niyandirtalî û çi yê Hişdar û şaristanî, çande, û zimanên destpêkî jî lê afirandin.

## Xelata Nobêl

Îsal Ekedîmiya Melekî ya Siwêdî xelata Nobilê ya Kîmiya da sê zanyaran; Zanyarê Siwêdî Tomas Lîndele, zanayarê Emerîkî Pol Modrêş û zanyarê Kurd Ezîz Sencer. Wan hersê zanyaran lêkolînên giring li ser Tirşa Rîbî ya Nûklerî û têkliya wê bi çareserkirina nexwaşiya ``pênçecanê`` re kirin. Hêjayî gotinê ye ku Xelata ji hêla zanyarê Siwêdî Elfrêd Nobl de ji bona pesendkirina Aştiyê tê dandin. Elfrêd Nobêl li sala 1867an Dînemît çê kiri û bi wê yekî deriyekî pir fere ji bona çêkirina çek û teqmeniyan vekir.




Loma jî wî piraniya samana xwe ji bo wê xelatê û pêkanîna aştiyê ji li cîhan terxan kir.

## Destpêka Şanoya Kurdî

**Edhem Şêxo**

Şano şaxek e ji wêje û çanda miletan û nîşanek mezin û girîng ya şaristanî û azadiya miletan e. Şano wek beşekê ji wêje, li welatên Ewrûpa hate holê, û ji wir kete nav wêje û çanda miletên Rojhelatê. Di vê gotarê de, emê bi kurtî ji xwendevanên delal re destpêka nivîsandina şano di edebiyeta Kurdî de nîşan bidin.

1-Em karin bêjin ku Evdirrehîm Rehmî Hekarî – 1890- 1958an, cara yekem şano bi zimanê Kurdî nivîsandiye û li sala 1919an di Kovara- JÎN- hejmara 15-16an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ew şano bi navê- Memê Alan- bû û ji du beşan pêk dihat, lehengên wê şanoyê jî çar kes bûn- Memê Alan, Lewend, Çavreş û Xezal.

2-Fûad Reşît Bekir – 1905-1993. Roleke girîn di şanoya Kurdî de lîst û gelek şano nivîsandin wek:

- Li sala 1924an şanoyek bi navê- Axa û Axajin nivîsand.


– Li sala 1928an şanoyek bi navê – Bedrewişt- weşand.

- Li sala 1930î şanoyek bi navê – Mamostaya kon-weşand.

– Li sala 1931ê şanoyek bi navê – Jinhênanî Kurdewarî-weşand.

3-Li sala 1928an Fayiq Bêkes û Ebû Bekir Şêx Cela bi hev re şanoyek bi navê – Şoreşa Ferensa- dinivîsin

4- Li sala 1928an Hisên Huznî Mukriyanî şanoyek bi navê – Derdê Derûn- di rojnameya Zarî Kurmancî-


KOÇƏKE DƏRƏWIN
(TƏQLID KRNA SUT CKNAVOR)
Ərəb Şamilov.
Pjesa dy fəsla—sezdə sьfəta
1930

hejmara 7- 8 de diweşîne.

5- Di sala 1930î de Ereb Şemo li Ermenistanê şanoyekê bi navê- Koçekê Derewîn- diweşîne.

6- Di sala 1931ê de li bajarê Koyê Xeyrullah Abdulkerîm şanoyekê bi navê- Kiçî Kurdistan- diweşîne.

7- Helbestvanê mezin Pîremerd di sala 1932an de şanoyekê bi navê – Mem û Zîn – diweşîne, û ew şano ji 22 rûpelan pêk hatiyê.

8- Di sala 1932an de li Rewandizê Tahir Sadiq şanoyekê bi navê – Miçêl- diweşîne

9- Li sala 1932an Heciyê Cindî li Ermînistanê şanoyekê bi navê- Qutiyê Dû Derman- dinvîsîne û çap dike.

10- Li Bajarê Şamê di Kovara – Hawar- Di hejmara 20an sala 1933an de, Celadet Alî Bedirxan şanoyekê bi navê- Hevind- diweşîne.

11- Di sala 1933an de li Bexdadê Ebû Bekir Hewrî şanoyekê bi navê – Dildarî û Peymanperwerî- çap dike

12- Wezîrê Nadir di sala 1935an li Ermînistanê şanoyekê bi navê- Reva Jinê- çap dike.

13- li sala 1935an li Ermînistanê Ehmedê Mirazî şanoyekê bi navê – Zemanê çûyî – çap dike.

## Destanbêj Ehmedê Nêsirê Çû Ser Qedera Xwe.



Li roja 01/11/2015`an, dengbêj û destanbêjê Efîrnê yê navdar Ehmedê Nasirê Şemê temenê xwe dît û goça xwe bar kir. Li wê boneyê hejmarek ji hevalên Partiya Yekîtî ya Dîmokrat a Kurd li gel sekretêrê partiyê mamoste Mihidîn Şêx Allî çûn seredana gundê Şadêrê û serê malbata wî û şêniyê gundê Şadêrê xweş kirin.

Mamoste M. Şêx Allî, gotineke kurt li bin konê sersaxiyê kir, tê de welatparêziya jidestçûyî û tevahiya malbata wî bilind nirxand. Cefa û keda wî di ber parastina kelepûr û zimanê Kurdî de jî anî zimên, û got, ku dilovanî Ehmedê Nêsir di ber malabat û zaroyên xwe de jî pir westan dît, wî zaroyên xwe bi perwerdeyeke netewî ye bilind mezin kirin û ew dane xwendin jî.

Hêjayî gotinê ye, ku hunermendê nemir Ehmedê Nêsr li gundê Şadêrê-Efrînê ji dayîk bûye, di maleke olêzdî de mezin bûye. Wî ji biçûkanî û xortaniya xwe de, şevbuhêrkên hunerî derbas dikirin; hîn bavê wî Nasirê Şemê bi xwe, dengbêjekî navdar ê destanên Kurdî bû. Mala wî û mala kurê wî Ehmed jî her dem mala mêvanan û camêriyê bû.

Bi goçbarkirina Ehmedê Nêsir rûpelek ji rûpelên dîroka hunera kurdî li Çiyayê Kurmênc-Efrîn hate pêçan. Bila serê malbat, dost û hemî gelê Kurd xweş be.

# BÊJE (gotin, şor) .... (1)

**BÊJE**: Peyveke serbixwe ye, ji kîtekê yan bêtir pêk tê, û wateyeke serbixwe dide.

**Cureyên bêjeyan**

Ji aliyê **BINESAZIYÊ** ve, bêje di zimanê kurdî de, çar cure ne:

**Bêjeya sade**(xwerû)

**Wekî: Mirov, welat, hatin, çû.**

Mirov nikane bêjeya sade ji hev bike, ji ber ku her kîtek bi tena xwe tu wateyê nade.

**Bêjeya pêkhatî**

Ew ji bêjeyeke sade û ji hinek pirtik tê darijtin. Pirtik jî du cure ne:

- Pêrkît(pêşgir) (*bi pêşiya bêjeyê dikevin*):

**Ve** + xwarin … **Vexwarin**

**Hil** + dan … **Hildan**

**Ber** + bang … **Berbang**

PÊRKÎTÊN sereke ev in:

**Vekirin, hilkirin, berdan, rakirin, rêkirin, vêxistin, dadan, rûxistin, badan, heraftin, wergerandin, bêkar, neyar, sersal, bindest, navsal.**

- Parkît(paşgir) ( *bi paşiya bêjeyê dikevin*) :

**Azad + Î … Azadî …** ***Dil+dar… Dildar***.

**Xwende + van … Xwendevan**

PARKÎTÊN sereke ev in :

- Parkîtên BIÇÛKER

**Mêrik, fedok, germişk, zirtone, tirsonek, kerole, perçe.**

- Parkîtên navê LÛSÊ: **Havîngeh, Kurdistan, nexweşxane, hêlîn.**

- Parkîtên navê ALAVÊ

**Birek , bêjing , çaydan , bihîstok.**

- Parkîtên RENGDÊRAN

**Zana, delal, bîrawer, gunehbar, gewre, belengaz, xuhsar, ronak, gilover, mêrane, virek, Kabcî, hişmend, bendewar, bextyar, çavdêr, sazbend, malsaz, canbaz, xebatkar, nêçîrvan, bîrewer, lezgîn, aldar.**

- Parkîtên ENDAMTIYÊ

**Gundî, arîn, perwîn.**

- Parkîtên RAYÊN LÊKERAN

**Tîravêj, dengbêj, alîgir, mêrkuj, desmal, welatparêz**

- Parkîtên HOKERÎ

**Aştiyane, çargoşe, hêvarkî .**

- Parkîtên bêjeyên RAZBER:

**Germayî, hevaltî, azadî, piranî.**

**3. Bêjeya hevdudanî**

Bêjeya hevdudanî yan ji pevgirêdana du bêjeyên sade, yan jî ji ducarkirina bêjeyekê pêk tê, nimûne:

**Tîr + kevan … Tîrkevan**

**Rast + rast … Rasterast**

**a. Ji pevgirêdana du bêjeyan**

Bêjen hene dikanin bi hev ve werin girêdan, û bêjeyeke din e nû çêkin:

DU NAVDÊR:

**Ar-av, dest-bira, dot-mam, dêl-e-gur, rê-hesin, ba-kur.**

NAVDÊREK û RENGDÊRK:

**Bal-dirêj, çav-reş, şev-e-reş, bex-treş, sor-gul, pîr-jin, xweşmêr, xuş-av.**

- *DU LÊKER yan LÊKEREK û BÊJEKÊ:*

**Kirîn-firotan, dan-û-standin, mêr-kirin, jin-anîn, reş-kirin, rind-kirin.**

- HOKER:

**Ber Berbang, berbext… Bin: Bindest, binçeng.**

**Der: Derbûn , derkirin… Î: îsal, îşev.**

**Paş: Paşeroj, paşber… Nav:Navdar, navkêl.**

**Dû: Dûmahîk , dûketin… Pişt: Piştvala, piştgirtin.**

**Ser: Serdar, serefiraz.**

-JIMARNAV û BÊJEK:

**Nîv: Nîvro, nîvtijî… Çar: Çarpêç, çargoşe.**

**Du: Durû , dumil… Sê: Sêkoşe, sêling.**

**Yek: yekdeng, yekgirtin.**

- CINAV û BÊJEKÊ :

**Jê: Jêkirin, jêhatî.**

**Tev (têk): Tevdan.**

**Lê: Lêdan, lêxistin.**

**Hev: Hevber, hevreng.**

**Pê (Pey): Pêma, peydakirin.**

**Pev: Pevketin, pevxistin.**

**Xwe: Xwefiroş, xweza.**

**Tê (di wî, wê): Têxistin, têdan.**

**Pê (bi wî, wê): Pêgirtin, pêdadan.**

**Lihev/lev : Levxistin, levkirin.**

- DAÇEK û BÊJEKÊ :

**Bi: Bicih, bigoşt.**

**b. Ducarkirina bêjeyekê**

Bi ducarkirina bêjeyekê bêjeke hevdudanî tê çêkirin, wek: **Nal-e-nal, rast-e-rast, ber-a-ber, reng-a-reng, yek-o-yeko**.

**4. Bêjeyên bargiranî:**

Bêjeyên bargiranî ji du hêmanan bêtir çêdibin, wek: **Bin-dest-î, ber-çav-ik, bin-av-kirin, li-ber-xwe-ketin.**

Di zimanê Kurdî de, hîn tu rêzik taybet ji sazkirina bêjeyên bargiranî re nehatine danîn.

# ZAROKTÎ PÎROZ E

■ Vejîna Kurd

Pend û şîreta kurdî dibêje: Zarok bi lîstinê mezin dibin. Lê mixabin, rastiya jiyana zarokên Sûriyê berûvajî vê pendê ye.. Wan bar û êşên ji xwe mezintir hilgirtine, û ji zaroktiya pîroz mehrûm mane. Di qeyrana Sûriyê de, ya ku ji bêtirî çar salan de berdewam e, herî zêde zarok di bin bandora şer de mane, bi hezaran hatin kuştin, bi melyonan sêwî û bê war man û rêjeyek pir bilind jî li hundir û derveyî welêt bûne penaber, lê ew rastî alozîne din jî hatin, ya sereke jî rewşa aborî ya xirab e..

Ji ber xizanî û tunebûnê, pir malbat neçar dibin zarokên xwe bişînin kar, di temenekî biçûk de dest bi kedê bikin û bi erkên mirovên mezin rabin. Û herweha ew zarokên biçûk ji mafên xwe yên bingehîn bêpar dimînin û di kargehan de ji hawîrdoreke paqij û azadiyên bingehîn têne bêparkirin, di heyam û mercên ku tê de kar dikin, ew di aliyê pêşketina fîzîkî, çandî, perwerdeyî û hestiyariyê de ziyanên mezin dibînin.. Û pir ji wan di paşerojê de toşî nexweşiyên giran û seqetbûnê dibin. Zarokên karker ên ku li kolanan û li kargehan di bin mercên dijwar de kar dikin, ne tenê li hundir Sûriyê, lê li dewletên hawîrdor jî tên dîtin, ew di karên ne yasayî û metirsiyê de dixebitin, rojane zêdetirî deh katjimêran û bi nirxekî zor erzan kar dikin, û herweha ji biçûktirîn mafên xwe tên bêparkirin, ew jî zaroktiya pîroz e.

Belê, xewn û hêviyên zarokên Sûriyê li ber lingên xizanî û bê aramiyê têk diçin, û nifşek bi temamî nezan dimîne..li ser ekraneke telefizhonê, zarokekî Sûrî bi navê Elî dibêje : "Temenê min deh sal in, dibistan tuneye û rewşa xizaniyê zor e... Xwendin pariyê nên nade me.. Divê ez alîkariya bavê xwe bikim".

Ma gelo zarokên wek Elî dê çawa zaroktiya pîroz bibînin û dê bi çi lîstikê mezin bibin?!!!

# Di Yeksaliyê de, Tendurustiya Zarok

■ Bijîşkê Newrozê

Paşeroja civakan bi paşroja zarokên wan ve girêdayî ye, ew jî li ser şêweya tîmarkirin û perwerdikirina wan radibe. Tendurustî jî stûnekî bingehîn e ji tîmarkirin û perwerdeya zarokan. Dema ku zarokek zaroktiya xwe bi rengekî pak, xweş û tendurustî derbas bike, ew li ser bingeheke tendurustî û derûnî ye rast radibe û bi hêz derbas jiyana xwe ya siberojê dibe, û bi wê yekê ev penda rast û durust pêk tê ((hişê durust, di govdeyê durust de ye)).

Ji kêlîka ku zarok ji dayîka xwe dibe de, tîmarkirineke nazik û cuda jê re gerek dibe.

Li destpêkê, pêwîst e jina ducanî[avis] bi destê bijîşk an pîrikeke şareza were zandin, çinkî ew kanin bi şêweya rast, bi hêsanî û bê ku ziyanek bigihê nûbûyî, yan jî dayîkê, karê xwe bikin.

Piştî çend katan ji dayîkbûnê, gerek e dayîk şîrmijê xwe dîne ser sîngê xwe û hewil bide wî bimêjîne. Ew yeka, him xwîna malçûk[rehim] zû dibire, hemî şîr bi dayîkê tîne. Ji bilî ku gelek hêmanên sûdar jî di ew şîrê destpêkê(gupik) de hene. Gava ku dayîk ji destpêkê de û bi rengekî bi rêkûpêk zarokê xwe nemêjîne, şîr bi wê netê, wê hîngê ew neçar dibe şîrê mangan ê ziwakirî (firingî) bide nûbûyî xwe, û ziyanên ku ji wî şîrî peyda dibin jî bikşînin. Wê çaxê, û eger neçarî ji bo dankirina şîrê firengî çêbû, pir giring e, ku ava ji bo amadekirina şîr were kelandin, şûşe jî heroj were kelandin û şuştin, çinkî gelek cureyên mîkroban lê dihêwirin û şîrmij nexweş dikin.

Pêçandin û girêdana qundaqa nûbûyî bi benikan, gerdişeke[adet] hîç nebaş û ne tendurustî ye, û ziyanên mezin jê peydsa dibin, wek jiciderketina xulekê``hestûyê sêvikê``. Gerek e tenê ciline lêhatî lê bikin û ji sermê û germê jî were parastin.

Aşle, gaveke bingehîn û giring e ji bo tendurustiya zarokan. Aşle zarokan ji gelek nexweşiyên xedar vedigire û diparêze, wek nexweşiyên wêranê, kulbûna kezeba reş, sorik, filîça zarokan, têtenos, kuxka qîqî û hwd. Aşle ji hefta destpêkê de ji temenê zarok dest pê dike, û pêwîst e ew bi rengekî bi rêkûpêk û di demên xwe de werin birin. Zarokê ku aşlan nebe toşî ew nexweşiyên navborî dibe û jiyana wan jî dikeve bin gefê.

Di warê dankirina zarokê şîrmij de, pir giring e ku ew were mêjandin, ji ber ku şîrê dayîkê paqij, minasib, xweş, hêsan û bê mesref e jî. Ji bilî ku karê mêjandinê, pêwendiya derûnî û dilovanî jî di navbera şîrmij û dayîkê de xurt dike, ew jî ji paşroja tendurustî û rewşa derûnî ya zarok re pir giring e. Lê piştî meha çaran, dayîk kane, û gerek e jî, tiştine din jî bide zarokê xwe, wek ava meywan, sîrîlek û hwd.

Pakbûn û pakirina zarok a bi rêkûpêk û di çaxên xwe de, wî ji gelek pirsgirêkên tendurustî yên derve û hundur diparêze, gerek e ew di dema xwe de were vekirin û navlingê wî were guhertin, çinkî, ji bilî ku ew yeka zarok ji gelek nexwaşiyan diparêze, ew vehesiyekê dide zarok û kesên li derdora wî jî.

Zarok wek çîçekan e, tu çiqas xizmet bikî, ewqas geş dibin, reng didin û binxweş dibin. Bila zarokjên me, bi tendurustiyeke baş malên me bixemlînin, sibehî bikin û serkeftî berve paşroja xwe herin.

**Mejiyê Ne … Dûmahîk**

û eger kesek hewildana derbaskitrna wan bike ew bi xêrnexwez, noker û neyar bi nav dibe, û dawiya wî zindan, lêdan û belkî windakirin be jî. Ev karên ne mirovane ji aliyê destlatdaran ve, pir di civakên paşmayî de, û nemaze di civakên Rojhilata Navîn de. tên kirin. Piraniya van rewşan çawa çêdibin? Belê; berî ku partiyek bigîne qunaxa destlatdariyê ew diyar dike ku wê demokrasiyê cîbecî bike, û heyameke pir xweş û gulane dê çêbike û bimeşîne. Bi wê diyardeyê re û ji ber ku piraniya civakê nikare rastî û nerastiyê ji hev vepincirîne, beşek ji wê civakê tev pirojeya wî alî dibe, beşek jî xwe jê ve nêzîk dike û yek jî tenê çepikan lêdide. Lê pir dirj nake, û nemaze piştî ku ew dibe xwedî hêz û lengerên xwe di civakê de diçepsîne, diyar dibe ku tiştek navê wê dîmoqratiyet nîne, û ew tenê xewnerojk bû. Mînakê weha di Rojhilata navîn de pir in.

Di pir welatan de, û di bin navê dîmoqratiyê de hilbijartinên derewîn hatine kirin, û ew bûye sedema ku hin kesayet bi dehê salan serok dewletê bimînin, û bi tekane serkêşiya wî welatî bikin. Û dema milet bibêje bes e ne tenê kevirên ji Sicîlê di ser wî de dibarin, lêbelê zîndankirin, kuştin, koçberkirin û şerekî mezin bi wî miletî re tê kirin. Herweha bajar, gund û hemû pirojeyên ku sûda milet têde hebe tên herifandin. Ango; ji bilî guhartin û rûxandina wê destlatdariyê her tiştek rewa dibe.

Di baweriya me de, kî û çi alî dibe bila be, eger mejî û zihniyeta wî ji ramana zordarî û yekaliyê ne rizgar be, tucarî nikare demoqrat be, ne jî kane hêvî û mafê civakê biparêze. ***Rizgarkirina mejî ji ya welatan dijwartir e.*** Lê sed carî mixabin; ta niha mejiyê ku li Rojhilata Navîn û nemaze ya siyasî û destlatdaran ji ramana yekalî û zordariyê nehatiye rizgarkirin. Ji ber wê jî, piraniya rikberên ku di bin navê şoreşê de jî radibin, ew jî bi ser nakevin. Çima? Ji ber ku zihniyeteke ne dîmoqrat û ji zordariyê ne rizgarkirî bi wan re jî heye. Ango armanca wan a serke ew e, ku wê destlatê birûxînin, û ew li şûna wê rûnin. Ma gelo piraniya rikbera Sûrî ji vê zihniyetê dûr e?

---

**Xwendina bi Zimanê … Dûmahîk**

da ku keça wan ji min re bibe hevjîna paşerojê. Diya keçikê ji hevalê min ê ku dibe xalê keçê re got: Ma te ev (Tata) ji kûderê nas kiriye keko?.

Tiştê ez dixwazim bêjim ew e, ku çiqas rêjîmên li Rojhilata Navîn bixebitin ku Îdolojiya xwe ya ji bo çespandina diktatoriyê di hiş û mêjiyê mirovan de bikin, lê nikarin heta heta wê fikira paşverû û nemedeniyane bimeşînin. Qezenca mirovan, yên ku xwendina xwe di bin sîberên diktator û nijadperestan de dixwînin ew e, ku mirov dikare bi zimanê ku rêjiman ew fêr kiribû, li dergehên dîtir ji fêrbûn û zaniyarê bikutin. Partiya Be`is bêhtirî 50 salî hewl dida ku Kurdan bike Ereb, û zimanê wan jî tarûmar bike, lê genç û ciwanên Kurdan ên bi darê zor zimanê Erebî fêr dibûn, dikaribûn bi ew zimanê ku li ser pişta wan hatibû danîn, li deriyên xwenasina Kurdan bixin.

Îro li herêma me, û di vê rewşa awarte de ku li Sûriye diqewime, riya vekirina xwendina bi kurdî ji zaro û nifşên me re vebyne, divê were parastin. Ji me hemyan tê xwestin ku em vê tecrubê zengîn bikin û îro Kurd bi taybetî, evî barê giran bi tenha xwe hildigrin. Qebûla dezgehên herêmî yan navnetewî bi birnameyên welatê me, dê li demeke din, yan jî di qonaxeke din de were lêkolînkirin. Lê tiştê herî baş ew e, ku Kurd birnameya xwe di nav civaka xwe de qebûl bike.

*Di meha Cotmehê de li seranserî herêmên kurdî li Sûryê, konfirasên rêxistinî ên şax, herêm û navçeyên Partiya Yekîtî Ya Dîmokrat a Kued li Sûryê hatin lidarxistin. Di konfirasan de, rapor û gotinên rêxistinan hatin xwendin, karûbar hatin nirxandin, bernameyên karên paşerojê hatin danîn û hevaline nû hatin hilbijartin. Emê li vir gotina Navça Dêrikê, wek nimûne, belav bikin.*

# Gelê me lawê xwe yê hêja Ehmed Bozan ji dest da

Li roja Sêşemê 27/1/2015`an dema ku hevalê me yê nemir Ehmed Bozan li gel dostê xwe yê şehîd Teslîm Xelîl Cimo li mala xwe li Gundê Curn – Girê Sipî- Reqa vedigerî, bombeyeke ku bi destên xwînvexwarên Da`işê û xwefiroşên wê li ber mala wî hati bû çandin di wan ve peqî û di encamê de her du nemiran jiyana xwe ji dest dan. Bi boneya şehîdbûna hevalê me Ehmed Bozan endamê Desteya Rêvebir ya partiya me Partiya Yekîtî ya Dîmokrat a Kurd li Sûryê, em serê hemî endam, alîgir, tevahiya Tevgera Kurdî, gelê me yê Sûryê û şêniyê Kobanê û Girê Sipî xweş dikin.

Hevalê me Ehmed di temanê 58 saliya xwe de bû. Wî bêtirî sî salî ji temenê xwe di nava rêzên partiya xwe de xebat kir. Wî her dem dostanî û pêwendiyên baş li gel çîranên xwe yên Ereb li Reqê û Girê Sipî datanî û diparast. Û bêtirî carekê jî dibû berpirsiyarê rêxistina partiyê li Reqê.

Piştî ku rêxistina Da`işê gundê wî talan kir, ew li gel malbata xwe çû Herêma Kurdistanê. Li wir, ta ku konfirana xwe ya dawiyê kir, rêvbiriya rêxistina partiyê li Herêma Kurdistanê pê hate hilpesartin.Ew li vê dawiyê vegerî welêt daku mala xwe li gundê Qerecurnê ji nû ve şên bike, lê mixabin destên qirêj li benda wî bûn.

Em hevalê xwe yê zor hêja Ehmed Bozan verê dikin, û serê heval û dostan li derve û hundirê welêt û malbat û mervên wî xweş dikin. Û têrorê jî li ser hemî kar û kiryarên wê şermezar û riswa dikin. Banga me li hemî



xelkê navçê ye ku ji bo metirsiyên ku têrorîstan li şûna xwe hîştine haydar bin, daku tu bûyerên din bi ser me de netên.

Nemirî ji bo hevalê me Ehmed Bozan.

Rûreşî û riswatî ji têrorên çepel re.

27 ê Cotmehê 2015

**Desteya Rêvebir ya**

**Partiya Yekîtî ya D'mokrat a Kurd li Sûryê.**

# Sersaxî



**Ji endamên serkirdayetiya partiya maf û azadiyan HAK – PAR ê re …**

**Rêz û silav ….**

Nûçeya mixwabîner a koçbarkirina serokê parta we, hêja Fehmî Demir, li ba gelê Kurd ciyê dengvedaneke berfireh bû, û li ba heval û hogirên partiya me li Sûriyê ciyê dilêşî û xemgîniyê bû.

Fehmî Demir di ber pirsa gelê Kurd, doza aştî û demokrasiyê de, cefakêşekî dilsoz û navdar bû . Bila hûn û hemî endam û alîgirên HAK – PAR ê xweş bin, xwedî û malbata nemir Fehmî Demir sax bin.

*Bimînin di xweşiyê de.*

**Birayê we…**

**Mihyedîn Şêx Allî**

**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

*Sûriya - Efrîn 27.10.2015*

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**